Wateya Cejna Evînê Çî ye?.

Dîlan Zivingî

Di dîroka her dewlet û gelên cîhanê de , bûne û rojên taybetmend hene , hin ji wan weke cejn û boneyên cîhanî têne diyar kirin mînak : Cejna Jinan , cejna Karkeran , cejna Zarokan , cejna Sersalê û W.K.D . Li ev çend salên dawîn, rûdawa cejna Evînê weke cejnke cîhanî hewş vedide û bi renkegî fermî ji hêla dewlet û civaka Sûriyê ve tête pîroz kirin . Ma gelo ... ; Bingeha vê çêrokê çî ye? Ji kû ve hatiye ?. Weke cêrok û dîroka wê nîşan didin , ev bûyer a gelê Romaîn ye. Di dîroka Romaiyan a kevnar de hersal di -15-ê Sibatê(Fibirayêr) de , ji bo xwedayên jinê((xono)) , zewicî , Sirûştê((Puno)) vestîval lidadixistin û qurban dikirin ! Emperetorê Romanî (Kilîniyas) fermanekê di dema şer û cengan de derdixe û zewaca evîndaran qedexe dike !. Bi nêrîn û baweriya Emperator ku zewac ziyanê li mêran dike û wan pir hejar û bê hêz dihêle. Vêca jî , ew di ceng û şeran de bi ser nakevin. Li raberî vê fermanê Elqdîs Felentîn radiweste, li dijî zordariya Emperetor alîkariya xelkê dike, pir mirazan dighîne hevdu û pir dewat û şahiyan pîroz dike. Li encama vê yekê, Emperetor fermana giritna (Felentîn) dide û wî davêje binê hepis û zîndanan. Felentînê me, di hepsê de ji keça qerdiyanê hepsê , ya ji herdu çavan ve kûr bû hezdike. Dîwar û sînorên olî diçirîne û bi evîndara xwe re dizewice ?!. Piştî zewacê herdu çavên keçikê vedibin û ew derdora xwe baş û xwaşik dibîne. Emperetor fermana darvekirina Felentîn dide . Ew ji berî darvekirinê , namakê ji evîndara xwe re dinivîse û imza xwe li bin dixe . Piştire Felentîn di -14-ê Sibatê de sala -270-an berî zayînê tê ye bidarvekirin. Lewre jî, Baba (Cilesîs) biryarê dide ku , roja -14-ê Sibatê ,roja darvebûna felentîn , li şûna -15-ê Sibatê ji bo bîranîna qidîs felentîn bibe cejna Evînê û hersal, ew roj bi gul û diyariyên curbecur û nemaze yên sor were Pîroz kirin. Wisan jî îro Felentîn li seranserî cîhanê bûye simbola evînê. Bi vê bûneyê zor girînge ku, em weke neteweke bindest, di vê warî de dewilemend û zengîn bin. Pir bûyer û serpêhtî di dîroka Kevin û nû di civaka me de hene, weke nimûne : Di sala -2007-an de , Dua ew keça ciwan a -17-salî li kastîna Şengalê bi hovîtî û regekî ne mirovane bi keviran wê dikujin. Ma gelo..; Gunehê wê çi bû?. Tenê li mafê xwe -weke keçik-xwedî derket û ji xortekî misilman û Kurd hezkir. ! Zor mixabin ku tevî em di sedsala bîst û yekan de ne , hêjî civaka me di bin gerdîşên pûç û vala de dinale. Xuyaye , zagona civakî di ser hemû zagon û pêvajokên demê re ne. Her weha ciqas pêwîste, em hersal di vê rojê de , li ser babetên ji vê rengî, di riya partî ,rêxistin û tevgera kurdî re û di nava civaka xwe de şirofe bikin . Belikîm em karibin bi vê awî hin asteng û pirsgirêkan kêm û ko bikin, rê li pêş jiyanike wekhevî , aştî , demquras ji nifşên nûgiha re dûz bibe . Lê dawî , rêz û silav li giyanê hemû evîndarên ku negihan mirazên xwe û ew bûne qurban .